Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :964 18-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Taybetiyek ji taybetiyên çanda Çerkesên li Minbicê

**Gelê Çerkes ji Qafkasya hatiye, ji mêj ve ji welatê xwe koçber bûe û ji ber şeran berê xwe daye Sûriye, Urdun û Filistînê. 120 sal di ser koçberiya wan re derbas bûne, lê dîsa jî çanda xwe diparêzin.**

Çerkes ji beriya 120 salan ve li Minbicê ne û hîn jî çanda xwe diparêzin. Êla El-Edxay a Çerkes li Minbicê dimîne û ji şaxên Ebzax, Becdûx, Beranet û El-Qebirday pêk tê. Ji pêkhateya Çerkes Samir Hebaq têkildarî mijarê got: “Çerkes 3 caran ji Rûsyayê koçber bûne; ya sereke sala 1846`an ji ber peymana di navbera Brîtanya, Fransa, dewleta Osmanî û Rûsyayê de bû. Bi vî awayî di koçberkirin û qirkirina Çerkesan de bi ser ketin.”

Samir Hebaq bi domdarî got: “Em qir bûn û li hemû cîhanê belav bûn, beşekê berê xwe da Tirkiye, Urdun û Sûriyê û beşek jî ber bi Ewropayê ve çû. Armanc ji koçberkirina Çerkesan desteserkirina herêmên me bû, ji ber ku bi xêr û bera xwe tê naskirin. Çerkesan ji Rûsyayê berê xwe da Bulxaristan û Tirkiyê û bi vî şeklî li seranserê cîhanê belav bûn. Beşa koçberî Sûriyê bû, li ser bingeha peymana bi dewleta Osmanî re li eniyên şer belav bûn da ku dewleta Osmanî biparêzin. Li Serêkaniyê, Minbic, Xenasir û gundên Himis û Colan êla Şîşan heye.”

Hebaq diyar kir ku Çerkes ji beriya 120 salan ve li Minbic ne û sala 1902`yan li wir bi cih bûne, êdî di navbera wan û niştecihên resen ên Minbicê de têkiliyeke xurt heye.

Hebaq destnîşan kir ku hejmara malbatên li Minbicê bi cih bûne, derdora 350 bû û bi destpêkirina aloziya Sûriyê re careke din koçber bûn, hin ji wan vegeriyan Rûsyayê û hin jî çûn herêmên di bin kontrola hikumeta Şamê de û hin jî ber bi Ewropayê ve çûn. Ji berê wê niha li Minbicê tenê 162 malbat hene.

Samir Hebaq anî ziman ku pêkhateya Çerkes dema çeteyên DAIŞ`ê herêm dagir kiribû, ji çanda xwe bê par mabûn, lê piştî herêm hate rizgarkirin, di çarçoveya pergala Rêveberiya Xweser de Komeleya Çerkesan hate avakirin û civata xwe bi rêxistin kirin. Hebaq da zanîn ku ew tev li saziyên rêveberiyê û çalakiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibin da ku çanda xwe bi pêkhateyên din bidin nasîn.

Samir Hebaq têkildarî zimanê pêkhateya Çerkes jî got: “3 zimanên pêkhateya Çerkes pê diaxivin, hene. Ji 3 êlên sereke jî ku ew jî Edxay, Qebirday û Şîşan in. Tîpên pê dinivîsin jixwe yên kirîlî ne û niha jî piraniya malbatên Qebirday li Minbic û Xenasir in û mezinên wan bi zimanên hev du bi hev re diaxivin lê ji bo zarokan derfetên fêrkirinê tune ne. Niha jî bi rêya komele û çalakiyan zarok fêrî zimanê çerkesî dibin.”



Samir Hebaq behsa cil û bergên Çerkesan jî kir û got: “Cilên wan ji kum (qilpiq) ku ji hiriya berxikan tê ristin, kirasê ku tê de berîkên mezin hene, pêk tên. Qame ew jî xencereke biçûk a ji zîv e ku ew jî nîşaneya siwar û şervanan e. Cilên jinan cuda ne li ser kumê li xwe dikin, nîşaneyên êlê li heye.”

Hebaq diyar kir ku 3 govendên sereke li gel wan hene ku ew jî Qafe, Şîşan û El-Wec in. Niha jî govendên wan tune ne lê dîlanên hêza mirov dide der hene. Gotineke Çerkesan a navdar heye ku ew jî “Yên ku nizanin bireqisin, nikarin şer bikin.”

Têkildarî çanda revandinê ku pê tên naskirin, Hebaq got ger xortek bixwaze bi keçekê re bizewice, bi razîkirina wê direvîne û dibe mala mezinê malbatê. Piştî ku mezinê malbatê bi malbata keça revandî re li hev were, zewac temam dibe.

Têkildarî xwarinên Çerkesan Rabîhe Îlyas got, ew bi ‘şibs basta, nexoşay û helûfe’ têne naskirin. Şibs ji ard, burxil û mirîşkê pêk tê. Nexoşay jî ji şîr, çay, xwê û îsot pêk tê û di şahiyan de tê danîn. Helûfe penêr û gulor e û di firinê de sor dikin an jî di zeytê de diqelînin.

***ANHA***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Endam | 1.Kesê ji komeke taybet: Endamê Koma Awazên çiya. Endamê partiyê. Endamê malbatê. Endamê gelekî. 2. Parçeyên bedenê: Mînak; çav û dest endam in. 3. Parçeyek ji tevayiya tiştekê. |
| Folklor (Fransî) | Zanista gel, zargotin, çîrok, helbest, stiran û govendên gelêrî. Hunera di nava gel de belav bûyî lê afrînerên wê nayên zanîn. |
| Komplo (Fransî) | Plana kesekî yan çend kesan li dijî kesekî, yan komekê, yan dewletekê. |
| Merasim (Erebî) | Dêlîndêz, rêûresm, ayîn, resmiyet, seremonî. Civîneke fermî ji bo pîrozkirin yan jî bîranîna kesekî yan bûyerekê: Ji bo bîranîna şehîdan merasimek hat lidarxistin. |
| Mêtîngeh | Kolonî, welatê yan devera dagîrkirî. Welatê biyanî tê de serdest in. |
| Mêtînger | Kesên mêtîngehan bi rê ve dibin, dagîrker. |
| Nivîsgeh | Bûro, ofîs, daîre, dezgeh: Em çûn nîvîsgeha kirîna xaniyan. |
| Pirtûk | Komek perên kaxizan yên binivîs yan biwêne yên di nava du bergan de hatîn çapkirin. Kitêb. |
| Proje (Fransî) | 1.Karekî diyarkirî yê ku piştî çend qonaxan diqede: Rêveberiyê ji bo bêkaran projeyek amade kiriye. 2. Plan, progrem, bername, amadekarî. Ti kes nizane ka plan û projeyên wî çi ne. |
| Şermezar Şermezarkirin | Şermezar: Kesên ketîn şermê, kesên ji ber kêmayiyên xwe şerm dikin: Ji ber ku bavê min dît ez cigareyê dikişînim, ez şermezar bûm. Şermezarkirin: Diyarkirina qebûlnekirina gotin yan kiryara kesekî yan hêzekê. Rûreşkirin: Welatiyan kuştina jinan şermezar kir. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Î | Z | ■ | H | ■ | A | F | E | T |
| 2 | N | A | V | E | N | D | ■ | F | A |
| 3 | ■ | X | ■ | K | A | ■ | A | R | ■ |
| 4 | N | O | T | A | ■ | A | ■ | Î | Ş |
| 5 | Ê | ■ | O | R | O | J | E | N | Î |
| 6 | R | A | ■ | Î | D | ■ | C | ■ | R |
| 7 | G | U | H | ■ | E | B | E | D | Î |
| 8 | I | ■ | O | F | ■ | Î | L | O | N |
| 9 | Z | O | ■ | E | M | R | ■ | T | ■ |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 2 | ■ | | ■ | | | ■ | | | |
| 3 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 4 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | | | | |
| 8 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 9 | ■ | | | | | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Kesê ne mirî... Pevdenga kurdî
2. Tîpên navîn ê “saet”ê... Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov an jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê tê gotin)
3. Paytexta Îtalyayê... Kurteya elementa Aktînyûmê
4. Cephe, bere... Kurteya her wekî din
5. Bayê rojhilatê
6. Kanaleke televîzyonê ya muzîkê ya kurdî
7. Bi qasî ku wergere, li aliyekî ketina keştiyê
8. Kurtebêja Antîmonê... Rojek... Cihê ku maden û xwê jê tê derxistin
9. Beşer, mirov... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.

**JOR-JÊR**

1. Notayek... Alava ku pê hespan tîmar dikin
2. Berhema ku nivîskarê wê nediyar e... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye
3. Notayek... Li hin herêman şûna ‘dayik’ê tê gotin
4. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin
5. Kurtebêja Ksenonê... Paytexta Kubayê
6. Mija ku li asîman berî baranan komî ser hev dibe û jê baran dibare
7. Axaftinên herêman
8. Cure, celeb... Sir, tiştê her kes pê nizane
9. Kurteya Koma Civakên Kurdistanê... Lewheya ku tiştan li serê dinivîsin an jî danebihîzan pê ve dikin

# Ji girtiyê 30 salan pirsa ‘tu poşman î?’ kirin: Berdana wî 3 mehan hat paşxistin

Lijneya Çavderî û Îdarî ya Girtîgehê ji Metîn Guven yê 30 sal in girtî, pirsa “tu poşman î?” kir. Ji ber bersiva wî ya “Min tiştekî ku jê poşman bibim nekiriye”, berdana wî 3 mehan hat paşxistin.” ***R-5***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 964 18-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## ‘Agir jî berdin bedena me em gundê xwe bernadin’

Jinên gundikê Mêrganê ku ji ber êrişên Tirkiyeyê yên li dijî Herêma Kurdistanê rojên zehmet derbas dikin, diyar kirin ku axa wan li wan tê qedexekirin û ev tişt gotin: “Dewlet dixwaze me birçî bihêle û em gundê xwe walabikin, lê agir jî berdin bedena me em gundê xwe bernadin.” ***R-3***

# ERDOGAN LI DÛ TINEKIRINA KURDAN Û PARÇEKIRINA SÛRIYÊ YE



## HPG: 427 dagîrker hatin cezakirin

HPG’ê bîlançoya şerê mehekê eşkere kir û ragihand ku 427 leşkerên Tirk yên dagîrker hatine cezakirin, helîkoptereke Skorsky, tankek jî di nav de gelek amûr û pêdiviyên leşkerî hatine tinekirin. Herwiha da zanîn ku di êrişan de 25 hevriyên wan jî şehit bûne. ***R-2***

## Gelo Tirkiye wê koçberên Sûriyeyî di êrişan de bi kar bîne?

Tirkiye di êrişên xwe de hêzên taybet yên PDK’ê û Tîma Xencerê bi kar tîne, lê dîsa encamê bi dest naxe. Hat zanîn ku niha jî koçberên ciwan yên sûriyeyî ku bi salane “perwerde dike”, ji bo ku di êrişan de bi kar bîne amade disekinîne. ***R-4***

## ‘Erdogan hewl dide guhertina demografiyê mayînde bike’

Evîn Cûma da xuyakirin ku Erdogan dixwaze beşek ji koçberan bişîne xaka Kurdan ya dagîr kirî û demografiyê bi rengekî mayînde biguherîne. Evîn Cûma got, “ev hem li dijî qanûnên navneteweyî ye hem wê şerê li herêmê girantir bike.” ***R-5***

## Pêşangeha pirtûkên kurdî ji bo nivîskarên Kurd gaveke girîng e

Bi armanca pêşkêşkirina berhemên wêjeyî û gihandina wan ya nifşên nû, herwiha pêşkêşkirina pirtûkên kevin û çapkirina pirtûkên nû bi zimanê kurdî, pêşangeha pirtûkên kurdî li qamişlo hat vekirin. ***R-6***



**Hewldana qirkirinê dewam dike**
Zekî Bedran
***R-5***

# HPG: 427 dagîrker hatin cezakirin

HPG'ê bîlançoya şerê mehekê eşkere kir û ragihand ku 427 leşkerên Tirk yên dagîrker hatine cezakirin, helîkoptereke Skorsky, tankek jî di nav de gelek amûr û pêdiviyên leşkerî hatine tinekirin. Herwiha da zanîn ku di êrişan de 25 hevriyên wan jî şehît bûne.

**Navenda nûçeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bîlançoya mehekê ya şerê di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Bazên Zagrosê de qewimî, eşkere kir.

**Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:**

"Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê ji kêliya destpêkê ya êrişê û pê ve her bihosta xaka Kurdistanê bi ruhê milîtaniya fedaî ya Apoyî kirin qada berxwedanê, bersiva pêwîst dan dagirkeran û derbên giran li êrişa dagirkeriyê xistin.

Xeta serketinê û ruhê fedaî yê Şoreş Beytuşşebap û hevrêyên pê re ku di sala 2021'ê de bersiv dan êrişa dewleta Tirk a dagirker a li ser Garê û bi berxwedana xwe Destana Lehengiyê ya Garê afirandin, Berxwedana Mamreşo û Zendûrayê ava kirin. Hevrêyên me ku xeta fedaîtiyê di asta herî bilind de temsîl kirin, li Girê Sor û Werxelê di dîroka berxwedanê ya gelê me de rûpelekî nû vekirin. Rêbaza milîtaniya Apoyî ku hêzê ji vê kevneşopiya berxwedanê digire, li gorî şert û mercên serdema nû hesabên dagirkeran hemû têk bir. Tîmên me yên gerîla yên bi tevger însiyatîfa li qadê timî di destê xwe de hiştin û bi rêbazên; serdegirtin, sabotaj, sûîqest û taktîkên cuda yên di nava hev de, çalakiyê afirîner kirin. Hêzên me yên Parastina Hewayî yên Şehîd Delal ku teknîka dewleta Tirk a dagirker pûç kirin û bi vî rengî derb li dagirkeran xistin, di vê pêvajoya mehekê de bi rola xwe rabûn. Hêzên me yên YJA Starê ji kêliya destpêkê ya êrişên dagirkeriyê û vir ve çalakiyên bi bandor kirin. Jinên Kurd ên şervan û berxwedêr ku xwe bi felsefeya Rêber Apo xemilandine, di şerê me yê azadiyê de nasnameya me ya xurt bi rengê herî bi hêz temsîl kirin. Li gel temsîliyeta xurt, şervanî, wêrekî û pêşengiya jinên Kurd ên azad di şexsê Şaristan, Mizgîn û Viyanan





de weke fermandarên Y JA Starê yên sembol û mînaka serdema nû şênber bû.

**Yek ji êrişên herî berfireh ên dîroka dewleta tirk a mêtinger tê kirin**

Dewleta Tirk a mêtinger ku bi tasfiyekirina têkoşîna me ya azadiyê re ku hêviya gelên bindest e, dixwaze armancên xwe yên dagirkeriyê pêk bîne. Ji bo vê jî derfetên xwe yên teknîkê hemû xistine dewrê û yek ji êrişên herî berfireh ên dîroka xwe dike. Tenê di nava mehekê de bi qasî ku hêzên me tespîtkirine; 1274 caran obus û top avêtiye qadên berxwedanê, 917 caran bi balafirên şer û 719 caran jî bi helîkopterên êrişê bombardûman kiriye, lê nekariyek encamekê ji van êrişan bi dest bixe. Artêşa Tirk a dagirker ku li gel van êrişan nekarî encamê werbigire, careke din dest bi bikaranîn rê û rêbazên şerê qirêj kir. Artêşa Tirk a



dagirker ku di encama bi sedan çalakiyên hêzên me de derbên giran xwar û nekarî bi pêş ve biçe, 164 caran li dijî Qadên Berxwedanê çekên kîmyewî bi kar anî û sûcê şer kir. Dewleta Tirk a mêtinger di vê êrişa xwe ya dagirkeriyê de di ser qadên di bin kontrola PDK'ê de ne gelek caran êriş kir û baregehên xwe yên leşkerî yên li nava Başûrê Kurdistanê bi rengekî çalak bi kar anî û ji van baregehan hêz şand Qadên Berxwedanê ku derbên giran lê dixwe. PDK'ê jî ji destpêkê ve bi her awayî piştgirî da êrişa dagirkeriyê ya dewleta Tirk a faşîst û qirker û ji bo artêşa Tirk li Zapê li binê erdê nekeve gelekî hewl da. Artêşa Tirk li gel her cûre piştgiriya ku jê re hate dayin jî bi vê êrişa dagirkeriyê nekarî bigihêje armanca xwe û di asteke cidî de şikest.

Gerîlayên me yên azadiyê yên Kurdistanê di nava vê meha dawî de bi rengekî dîrokî li ber xwe dan û hunera xwe ya bilind a şer nîşan dan. Bêguman bi ked û hewldanên şehîdên me ku bi ruhê fedaî yê Apoyî şer kirin û tevlî karwanê nemiran bûn, ev encama xurt hate bidestxistin. Di nava êrişa dagirkeriyê ya mehekê de 25 hevrêyên me tevlî karwanê nemiran bûn û bûn misogeriya Kurdistana Azad. Gerîlayên Azad ên Kurdistanê bi performans, sekna fedaî û rêbaza şer a milîtanî careke din nîşan dan ku xwedî wê hêzê ne bersivê bidin her cûre êrişên li ser xaka Kurdistanê ya pîroz û gelê me û bûn rûyê pak ê gelê me.

# Komxebata Şêwira Jinên Kurd ya Rojava bi dawî bû

**Komxebata "Şêwira Jinên Kurd ya Rojava" ya bi pêşengiya Kongreya Star bi tevlîbûna 50 delegeyên jinên ji rêxistin û partiyên siyasî li dijî êrîş û dagîrkeriya dewleta tirkî hat lidarxistin, bi encamên girîng bi dawî bû.**

Li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta tirk Kongerya Star Komcivînek bi navê "Şêwira Jinên Kurd li Rojava" li darxist. Armanca vê şêwirê ew e ku jina kurd rol û helwesta xwe li hember dagirkeriya li ser Kurdistanê bîne ziman. Piştî rojeke tijî nirxandin û nîqaşên girîng li ser guhertin û pêşketinên siyasî, her wiha helwesta jinan li hember hemû rêbazên qirker li ser civaka kurd şêwira û civîn bi biryarên girîng hate bidawî kirin. Daxuyaniya bidawîbûnê ji aliyê Endama Komîteya Diblomasî ya Kongreya Star Bencewîn Elî ve hate xwendin.

helwesteke hevbeş:

• Helwesta netewî li hemberî dagirkeriyê pêwist dike zelal bibe û têkoşîna li dijî dagirkeriyê li ser axa Kurdistanê erkeke netewî ye û jin pêşenga vê erkê ne.

Di heman demê de xwedîderketina li berxwedana şervanên Tevgera azadiyê li dijî dagirkeriyê erkeke netewî ye.

•Hevkariya bi hêzên dijminên Gelê Kurd re xetê me yê sor e û bi tu awayî nayê qebûl kirin, divê li dijî vê yekê helwestek xurt û bi bandor were pêşxistin.

•Weke jinên Kurd pêwiste em hêza xwe ya siyasî û partî li derve kom bikin da em bikaribin mûdaxeleyên bi bandor li ser rewşa siyasî li Kurdistanê bikin, her wiha xebatên jinan di asta netewî de xurt bikin.

•Divê di asta Rojava de jî xebatên ji bo avakirina yekitiya jinên Kurd bi hêztir werin meşandin ev jî erka me hemûyan e bi vê armancê wê insîyatîfeke jin were pêşxistin.

•Divê dîplomasiyeke netewî bi armanca têkbirina siyasetên




qirêj were pêşxistin.

•Şêwra me bang dike ku Sêyemîn Konferansa Netewî ya Jinên Kurd lezgîn were lidarxistin. Bi vê armancê em bang dikin ku komîteya amadekar a konferansê li ser asta herçar parçeyên Kurdistanê bicive û biryarê çêkirina konferansê bide.

•Xebatên xurt û encamgerî ji bo rizgarkirina hemû jinan. Komcivîna "şêwira jinên Kurd li Rojava " bi dawî bû.

***JNHA***



# Ziman bi xwedîderketinê tê parastin

Bi rasthatina salvegera Kovara Hawar û cejna zimanê Kurdî, li ser ev asta ragihandina Kurdî li Rojavayê Kurdistanê û rola wê ya di zimanê Kurdî de, rojnamevanên li Rojavayê Kurdistanê ji ajansa me re axifîn.

Edîtorê beşa Kurdî ya Rojnameya Ronahî û Nivîskar Diyar Botî, da xuyakirin ku êrişên li ser zimanê Kurdî û polîtîkayên bişaftinê pir zêde ne. Lewma asta axaftina bi zimanê Kurdî her ku diçe kêmtir dibe, bi taybetî îro polîtîkayên bişaftinê bi pêşketina teknolojiyê ketine her malekê; ev yek pir xeter e, îro gelek dayikên ku dervayî Kurdî ti zimanan nizanin, zarokekî ku Kurdî nizanin mezin dikin û wiha dom kir: "Êdî dê û zarok hev û din fêm nakin, ev êşeke pir mezin e. Ji ber vê jî di roja me de rola ragihandinê di pêşxistina zimanê Kurdî de girîngtir dibe. Di parastina zimanê Kurdî de sê lingên esasî hene; axaftina bi devkî, perwerde û ragihandin."



**`Bi saya ragihandina kurdî kurdan ji hev fêm kir`**

Di axaftina xwe de Diyar Botî, destnîşan kir ku derketina radyo, kovar û televîzyonan di parastin û pêşxistina zimanê Kurdî de roleke girîng lîst. Rola kovar û rojnamayan di parastin û pêşxistinê de heye. Bi taybetî jî kanalên Kurdan roleke girîng lîst, dîroka wê jî xwe dispêre ١٩٩٥'an. Bi vî awayî gelek herêmên Kurdan ku ji hev fêm nedikirin, hev û din fêm kirin. Ji ber vê ragihandinê, ji aliyekî ve ziman parast û di asteke de pêş jî xist."

Diyar Botî di warê şîrovekirina dîroka ragihandina Kurdî de wiha pê de çû: "Ragihandina Kurdî di ١٩٩٨'an de bi rojnameya Kurdistanê destpê kir, destpêkeke pir baş bû; lê zêde berdewam nekir. Dîsa di ١٥'ê Gulana ١٩٣٢'yan de di pêşengtiya Celadet Bedirxan de bi hatina gel hev a komeke rewşenbîr bi navê Hawar, kovarek derxist. Sedema ku ev roj weke roja zimanê Kurdî tê pîrozkirin jî ev e. Di ١٩٤٢'yan de jî weke berdewamiya Kovara Hawar, Kovara Ronahî tê derxistin û ev jî tenê du salan berdewam dike."

**`Rewşa şer bandora xwe li ser pêşxistina ziman û xwendinê dike`**

Diyar Botî behsa rojnameya Ronahî kir ku niha kar û xebatê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeşîne û da zanîn ku rojnameya Ronahî berdewamiya Kovara Hawar û Kovara Ronahî ye. Navê rojnameya Ronahî jî, li ser navê kovara Ronahî ye. Weke rojnameyeke Kurdî û erebî derdikeve û heftê du caran weke kaxiz tê çapkirin. Ev yek li vê qadê derfeteke mezin e, dikare hem ziman biparêze, hem dikare pêş bixe.

Nivîskar Diyar Botî, wiha dirêjî da axaftina xwe; "lê em nikarin bibêjin ev erka xwe tam pêk tîne. Ji ber ku li Rojhilata Navîn çanda xwendinê pir kêm e. Her wiha ev ١٠ salan zêdetir e li herêmê şer heye, ev yek jî li ser xebatên ziman û xwendina rojnameyê bandora xwe dike. Her wiha derketina telefonan û înternetê, li seranserî cîhanê bandor li ser xwendinê bûye. Lê dîsa jî hewildana me heye ku em vê çandê bidin rûnişkandin."

Diyar Botî, da xuyakirin ku Rojnameya Ronahî di weşana xwe de behsa hemû pêwîstiyên civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Biçûk mezin, di her warê jiyanê de agahiyan dide; qada leşkerî, siyasî, jiyanî, civakî û her wekî din. Dîsa ji bo biçûk û mezinan, ji bo hemû pêkhateya civakê qala wan dike û wiha got: "Dema Kurdek rojnameyeke Kurdî bibîne, tenê ji vê dîtinê bandor dibe. Lewma berê di xewna xwe de jî nedîtibûn, lê rojname îro diçe ber deriyê wî. Qala wî dike û ya herî girîng jî Kurdî ye. Ev yek bandorê dike. Kovara Mizgîn jî weke pêveka Rojnameya Ronahî ji bo zarokan derdikeve."

Edîtorê beşa Kurdî ya Rojnameya Ronahî û Nivîskar Diyar Botî wiha axaftina xwe bi dawî kir; "bi awayekî giştî hemû dezgehên ragihandinê yên Rojavayê Kurdistanê hev û din temam dikin û erkeke girîng dilîz in. Ev yek jî bi taybetî ji bo nifşên nû derfeteke pir mezin ava dike. Bi vî rengî ez bawer dikim ku ji sê lingan lingekî esasî yê parastin û pêşxistina ziman bi erka xwe radibe."

**`Di her qadên şoreşê de xebatek pêk hat`**

Pêşkêşvana Ronahî Tv Hebûn Omer jî, destnîşan kir ku ji bo geşkirina zimanê Kurdî di şoreşa Rojava de di gelek qadan de xebat hatin meşandin û got: "Ji dibistanan heta bi dezgehên ragihandinê, di her qadê de ji bo zimanê Kurdî xebateke berfireh pêk hat; pêşketineke berbiçav hat dîtin, êdî her kes bi rêya ragihandinê edat, ziman û çanda Kurdî nas dike."

Hebûn Omer, têkildarî rola ragihandinê di şoreşê de da xuyakirin ku ragihandina Kurdî bûyerên ku di nava şoreşê de rû didan bi giştî şopandin û sîstema ku civak xwe tê de birêxistin dike derxist û got: "Li Rojava gelek gav ji aliyê ragihandina Kurdî ve hatin avêtin. Ev gav jî xwedî giringiyekê ne, ji ber rol di danesîna civakan de lîst. Bi taybetî bi şoreşa Rojava re li Rojava şoreşa ragihandina Kurdî pêk hat. "



**`Axaftina kurdî li ser ekranê li xweşiya me tê`**

Di nava axaftina xwe de Hebûn Omer, destnîşanî rola dezgehên ragihandinê di şoreşa Rojava de kir û got, "ji dezgehên serekê yê ragihandinê ku karîbûn bi şoreşê re têkevin nava xebatê; Ronahî Tv û Ajansa Nûçeyan a Hawarê bû. Em dibînin çi qasî gelê me ji Ronahî tv fêrî lixwekirina cil û bergê Kurdî bû; ev yek ji nava tişta piraniya caran bi me re derbas dibe, her kes ji me re dibêje cil û bergên Kurdî çi qasî xweşik in, axaftina we li ser ekranê bi zimanê Kurdî li me xweş tê."

Pêşkêşvana Ronahî Tv Hebûn Omer wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Ji bo bilindkirina asta zimanê Kurdî pêwîste her mirovek li ser medya dijîtal bi zimanê Kurdî nûçe yan nerînên xwe parve bike, pirbûna zimanan ne şaş e; dive dest pêkê mirov li zimanê xwe veger e, ev yek giringe ji me her kesî re."

**`Zimanê medya weke kevirekî bingehîn e`**

Edîtora beşa Kurdî di Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) de Canê Xemgîn, bal kişand ser Şoreşa Rojava û ew sores, weke şoreşa ziman jî pênase kir û diyar kir ku di şoreşê de




derfeta perwerdeya bi zimanê Kurdî hat peydakirin û wiha dom kir, "gelê ku rastî ew qas zehmetiyan hatiye, layîq e ku bibe xwedî medyayeke ku bi rastî jî wêrek û çalak be. Bi hest, qirîn, azar, êş û rastiyên li vê erdnîgariyê diqewimin û şoreşa ku bi zimanekî xweş bi zimanê wan ê dayîkê derxîne; lewra jî ev berpirsyariya herî mezin dikeve li ser mile ragihandinê."

Canê Xemgîn, di destnîşankirina li ser giringî û asta çapemeniya Kurdî de da xuyakirin ku ziman di medya û çapemeniyê de weke kevirekî bingehîn e; çi qasî zimanekî baş û xîtabek bi hêz di medya de were kirin, ew qasî armancê wê medyayê, bîrdoziya ku dixwaze belav bike bi cih dibe.

**`Li rojava çavkaniya sereke anha ye`**



Canê Xemgîn, destnîşan kir ku Ajansa Nûçeyan a Hawar bi berpirsyariya xwe ya dîrokî ferq kir; ji destpêkirina şoreşê agahdarkirin, perwerdekirina civakê barê parastin û pêşxistin zimanê Kurdî hilda ser milê xwe, karîbû heta astekê pir baş di nava civakê de çand û zimanê dayîkê belav bike û wiha dom kir: "Ji ber ku têgehên ku di medya de tên bikaranîn; hem weke çavkaniyeke di milê rêzimanê Kurdî de ji bo civakê esas tê girtin û hem jî li ser qadên jiyana şêniyên li vê herêmê bandor dikin. Ji ber ku her têgehek tê bikaranîn bi xwe re têgîn diafrîne. Dema em qala pêşxistina ziman dikin, nayê wê wateyê ku em tenê hin peyv, têgeh û hevokan li zêde û nû bi kar bînin; helbet ev jî nav de heye, lê li kêleka wê jî tê wateya pêşxistina fikir, jiyanê û pêşxistina asta civaka li vê herêmê jiyan dike û bandorek mezin li ser wan çêdike."

Canê Xemgîn da zanîn ku Ajansa Nûçeyan a Hawar ji bo yekkirina xîtaba Kurdî, afirandin û pêşxistina zimanê akademik di nava civakê de kedek mezin da û wiha got: "Li Rojavayê Kurdistanê qanalên din yên Kurdî, çavkaniya wan a sereke ANHA ye. Em dizanin di her herêmekê û bajarekê de radyoyên herêmî hene, di aliyên nûçeyan de yê ku çavkanî esas digrin ANHA ye. Ji lewra jî barê herî mezin dikeve li ser milê ajansên ku xebatên nivîsikî didin meşandin."

**`Zimanê ragihandinê xîtabê her kesî dike`**

Di axaftina xwe de Canê Xemgîn, bal kişand ser zimanê ragihandinê û diyar kir ku ji zimanên zanistî, dibistan û lêkolînan cudatir e; ji ber yekser nameya ku dixwaze bigihîne digihîne şopînerê xwe, ya din jî zimanekî pir sade bi kar tîne. Dibe ku lêkolîn an jî akademî xîtaba hin beşên civakê tenê bikin, lê belê medya ne wisa ye; dikare xîtabê şivan, mamoste û dayîkekê bike û wiha dom kir, "lewra jî tiştên têkildarî ziman nûçeyên bi Kurdî, dosya û raporên ku tên çêkirin û belavkirin, ji bo her kesê wê çanda ku bi zimanê Kurdî di jiyana xwe ya rojane de bikartînin bi demê re vê yekê pêşdixîne."

Edîtora beşê Kurdî di Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) de Canê Xemgîn di dawiya axaftina xwe de ١٥'ê Gulanê; hem cejna zimanê Kurdî û hem jî salvegera derxistina kovara Hawarê li hemû gelê Kurd, hemû kesayetên ku ked û xebatên hêja meşandine, li hemû rojnamevanên di xeta çapemeniya azad de kar dikin, pîroz kir.

***ANHA***

# Pêşangeha pirtûkên kurdî ji bo nivîskarên Kurd gaveke girîng e

Bi armanca pêşkêşkirina berhemên wêjeyî û gihandina wan ya nifşên nû, herwiha pêşkêşkirina pirtûkên kevin û çapkirina pirtûkên nû bi zimanê kurdî, pêşangeha pirtûkên kurdî li Qamişlo hat vekirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di salvegera Roja Zimanê Kurdî (15`ê Gulanê) de Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Pêşangeha Yekê ya Pirtûkên Kurdî ya bi navê (Bi Kurdî Bixwînin, Bişaftinê Hilweşînin), li Navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo vekir. Di pêşangehê de zêdetirî 10 hezarî pirtûk û bi her pênc zaravayên kurdî hatin pêşkêşkirin, herwiha 15 weşanxaneyên li Rojava, Dîwana Wêjeyê, Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Yekîtiya Nivîskarên Kurd yên Sûriyê, Saziya Zimanê Kurdî beşdarî pêşangehê bûn.



### Pêşangeha zimanê kurdî gaveke pîroz e

Nivîskarê Kurd yê 80`ê salî Ebas Ismaîl ku ji sala 1982`yan ve pirtûkan bi kurdî dinivîse li ser giringiya pêşangehê wiha got: Ez tevlî gelek pêşangehan bûme, niha jî ez tevlî pêşangeha pirtûkên bi zimanê kurdî bûme. Vekirina pêşangeheke bi zimanê Kurdî gaveke pîroz e û girîngî û bandora xwe li ser civakê heye. Di rewşa me ya niha de pêşangên bi zimanê kurdî pir girîng in û pêwîstiya her mirovî pê heye.

Ebas Ismaîl da zanîn ku 32 pirtûkên wî yên bi zimanê kurdî hene û axaftina xwe wiha domand: Piraniya pirtûkên min çîrok, gotinên pêşiyan û folklor in. Hin caran ez helbestan jî dinvîsim. Min li ser jiyana Selahedînê Eyûbî min romanek û li ser jiyana Kurdên Sûdanê pirtûkek nivîsiye.

Ebas Ismaîl bîr xist ku berî niha beşdarî pêşangeha Şehîd Herekol bûye û got, ez tevlî her çar salên lidarxistina pêşangeha Herekol bûme û her sal pirtûkên min hatine xelatkirin.

### `Pêşangeha yekê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê`



Endamê Dîwana Wêjeya bakur û rojhilatê Sûriyê û nivîskar Botan Ednan Hoşê, ku bi çîrokên xwe yên cuda beşdarî pêşangehê bûye diyar kir ku pirtûkên wê li ser şoreşê, zarok û civakê ne û got, pirtûkên min tev bi zimanê kurdî ne ez ti caran bi erebî nanivîsim. Em pir kêfxweş in ku pêşangeheke wiha hat lidarxistin. Ev cara yekê ye pêşangeheke wisa bi vî rengî li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê tê vekirin. Ev pêşangeh ji bo gelê herêmê, bi taybet jî nivîskarên Kurd pir biwate û gava pêşketinê ye.

### `Pêşangehên bi vî rengî çand û hunera civakê diparêzin`

Botan Ednan di dawiya axaftina xwe de got, mirov bi





pêşangehan mewhîbe û xebata xwe ya bi salan derdixe û pêşkêşî civaka xwe dik. Niha jî di pêşangeha pirtûkên kurdî de gelek nivîskar nivîs û pirtûkên xwe, herwiha keda bi salan pêşkêş kirin. Pêşangehên bi vî rengî di serî de ziman, çand û hunera civakê diparêzin û pêş dixin.

### `Pêşangeha pirtûkên kurdî zimanê dayîkê pêş dixe`

Keça bi navê Rona Egîd ya 13 salî jî ku beşdarî pêşangehê bûye wih axivî: Pirtûkxaneya min ya bi navê Şehîd Herekol heye. Jimara pirtûkên min 1410 e û sernavên wan jî 95 in. Ez bi pirtûkên xwe beşdarî pêşangehê bûme. Ji şeşsaliya xwe heta niha min 300 pirtûk xwendine. Pêşangeha pirtûkên kurdî, zimanê dayîkê pêş dixe. Rona di dawiyê de bang li zarok û ciwanan kir ku li çanda xwendinê xwedî derkevin, herîwha zimanê xwe biparêzin û paşroja xwe bi xwendina pirtûkan ava bikin.

## Di xetera qirkirinê de rewşa rewşenbîrên Kurdistanê



**Armanc Hêvî**

Têgîna rewşenbîr di tevahî cîhanê de li gorî şert û mercên civakê û pergala heyî ya welatan pênaseya xwe dibîne. Wek têgîn derketina rewşenbîrî jî her çi qas Rojava (welatên Ewropî) kiribe malê xwe, di bingehê de cewherê xwe ji Rojhilata Navîn belav bûye û her welatek li gor xwe şîrove kiriye û xwedî derketiye. Ser vê esasê ji bo Kurdistanê jî pênaseya rewşenbirî di nava xwe de xweserbûnê dihewîne. Ji ber ti welatek mîna Kurdistanê nehatiye perçekirin.

Perçebûna welat bandorê xwe ser tevahî bûyer, diyarde û jiyana mirovan kiriye. Her perçeyekê Kurdistanê de rejimên heyî li gorî berjewendî û desthilatdariya xwe civakê rêve dibe û pergalê xwe dide rûniştandin. Di nava vê pergalê de wek netewa Kurd di dirêjahiya dîrokê de pêşiya hebûn, nasname, çand, kevneşopiya xwe parastin û hest û ramanên xwe anîna ziman de gelek astengî û zehmetiyên cûr bi cûr derketiye holê. Di heman demê de li hemberî zext û zordariya pergalên serdest wek parêzvanên civakê kesayetên bi hêz jî derketine.

Mixabin her raperînê ku pêşketine bi têkçûnê encam bûye. Sedema xwe yê esasî jî nebesiya hevgirtin, yekîtî û rêxistinkirina civakê bû. Bi vî awayî jî dek û dolabên dijmin li dijî civakê, îxanetkar û hevkarên xwe ava kiriye. Dema kesayetên bi wêrekî li hemberî pergala serdest serî radikir yan dihatin darvekirin, kuştin yan jî sirgûn û mişext dikirin. Ew rewş ne tenê perçeyekî tevahî Kurdistanê de rû dida. Bi demê re ew perçebûna erdnigarî feraset, hişmendî û jiyana mirovan de jî perçebûnê ava kiriye. Ji dîrokê heya roja me ya îro jî ew perçebûn her çi qas hin guhertin hebin jî didome. Kurtasî piştî van bibîrxistinên dîrokî ser rewşa rewşenbîrên Kurdistanê û wek gelê Kurd pêvajoyê ku em tê de derbas dibin bînim ziman. Jixwe di wir de derfetên ku bi firehî bûyerên dîrokî vekin tune ye. Mebesta nivîsê jî ne ew e. Lê weke ku tê zanîn roja me ji dîrokê ne qut e. Her pêşketin û geşedanên rû didin çavkaniya xwe ji dîrokê digirin.

Çarçoveyeke giştî de dema mirov li têgîna rewşenbiriyê dinêre nêrandin û nirxandineke kêm û nebes tê dîtin. Dîsa di wir de pirsa 'Rewşenbîr kî ye?, Ji kî re rewşenbîr tê gotin?, Armanca hebûna rewşenbîrî çiye?' derdikeve holê. Tenê bi nivîsandin, pirtûk, kovar, rojname derxistin, di nava xwe de çend çalakiyên çandî û hunerî pêş xistin rewşa me ya îro ku civaka me di bin xeteriya qirkirinê de ye, her kêlî destwerdan, tehdît û êrîşên dagirkerên Kurdistanê hene têrî nake û di esasê xwe de rola bingehî ya rewşenbîran ji holê radike. Kurtasî pêşxistina civakê di bin berpirsyariya rewşenbîran de ye. Lê belê her ku mirov çavdêrî dike hebûna rewşenbîrî di nav civakê de pir lewaze.

Bi navê "hevgirtin" û "yekîtî" de tenê xîtabî beşekê mirovan dike û hêlîna xwe yê teng de jiyana xwe didomîne. Aliyeke din binêrin feraseta lîberalîzm ango takekesî jî rewşenbîrên Kurdistanê de pêş ketiye. Jixwe razîbûn, xwe di jorî civakê de dîtin, weke kesayeteke zane, bi aqil, navdar pêş dikeve. Yanî berhemên ku tê dayîn pîvana civakê de çi qas encam dide û civakê pêş dixe ew jî mijara nîqaşê ye. Divê rewşenbîr aligirê demokrasî, wekhevî, azadîxwaziyê be. Dikare ji partî û saziyên siyasî cûdatir her roj nava civakê de bin û zanebûna xwe bi civakê re parve bikin. Lê ew erk û berpirsyarî ji siyasetmedaran re hatiye hiştin. Jixwe perçebûna ku partiyên siyasî ya Kurdan de nahêle yekîtiya netewî ava bibe û li hember dijmin hêzeke yekgirtî pêş bikeve. Ew rewş tevî ku ji aliyê herkesi ve tê dîtin mixabin rewşenbîrên me neçar û teng dimînin. Di nava vê aloziyê de yê ku ber linga diçe civak bi xwe dibe. Partiyên xwe dinyayekî ye û rewşenbîrên xwe dinyayekî ye. Vê demê çawa li hemberî qirkirin, bişaftin, destwerdan û êrîşên dijmin bisekinin! Rewşeke wiha xeteriya qirkirinê de ti kes nikare xwe di hêlîna xwe de veşêre. Taybet yên weke pêşengên civakê tên pênasekirin nikarin ji rêze tevbigerin. Bi taybetî rewşenbîrên Kurdistanê her alî ve pêşketin û geşedanên ku rû didin xwe berpirsyarê sereke bibînin. Dema ku ew berpirsyarî bi cewherî pêş bikeve pêwîstî ji siyasetmedaran namîne. Ji ber rewşenbîrên ku civaka xwe ronî û rewşen kiribe, anîbe asta ku karibe xwe biparêze û têkoşîn bike vê demê yekîtî, hevgirtin û xwe bi xwe rêvebirina civakê pêş bikeve. Hîn dem heye û tiştê ku winda bikin jî nemaye.



# 'Agir jî berdin bedena me em gundê xwe bernadin'

Jinên gundikû Mêrganê ku ji ber êrişên Tirkiyê yên li dijî Herêma Kurdistanê rojên zehmet derbas dikin, diyar kirin ku axa wan li wan tê qedexekirin û ev tişt gotin: "Dewlet dixwaze me birçî bihêle û em gundê xwe vala bikin, lê agir jî berdin bedena me em gundê xwe bernadin."

Artêşa Tirkiyeyê (TSK), di 17'ê nîsanê de bi hevkariya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li dijî herêmên Zap, Avaşîn û Metîna yên Herêma Kurdistanê dest bi êrişeke hewayî û bejahî kir. Êrişa bi hevkariya PDK'ê di 29'an de didome. Ji bo êrişê ji bajarên Qeyserî, Hatay û Bolûyê tîmên tevgera taybet anîne Colemêrgê û li bargehên li ser xetên bi sînor bi cih kirine. Ji ber şerê ku tê meşandin li gundên li ser xeta sînor ji gundiyan re gelek astengî tên derxistin û tê xwestin ku gundî ji gundê xwe derkevin.

Li navçeya Çelê, jinên li mezraya Mêrgan a gîrêdayî gundê Gêman bertek nîşanê êrişê û astengiyên ku ji ber êrişê ji wan re tên derxistin dan û pirsgirêkên ku dijîn anîn ziman.

### 'Ji ber qedexeyan nikarin karê çandinî bikin'

Şêniya mezrayê Esmer Demîr, diyar kir ku ji ber zext û zordariya leşkeran her roj bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin û wiha got: "Ji ber qedexeyên ku ji bo êrişê danîne ser gund em nikarin pezê xwe bibin çêrê. Em fikaran dikin ku pezê me telef bibe. Heke pezê me neçin zozanan û derdorê gund negere wê çawa zikê xwe têr bike. Timik bi ser malên me de digirin. Ji ber şer û êrişan liv û tevgera me ya li gund hatiye qedexekirin. Em nikarin karê xwe yê çandiniyê bikin. Heta ku ev zextên li ser me bi dawî nebin wê rewşa me tim wiha be."

### 'Heta ku em nemirın em ê dev ji axa xwe bernedin'

Di berdewamê de Demîr, da zanîn ku dema diçin zozanan bi astengiya leşkeran re rû bi rû dimînin û derbarê mijarê de ev tişt got: "Axa me li me qedexe dikin. Jiyana me tenê bi nava gund ve hatiye bisînorkirin. Navê ev tiştê ku tînin serê me zilm e. Leşker ji me re dibêjin, 'Hûn li gund zêdetir nikarin biçin'. 18 sal in li gund de dijîm û her sal ji bo çûyîna me ya zozanan ji me re zehmetiyan derdixin. Dixwazin bi van pêkanînên xwe me li gund birçî bihêlin û em gund vala bikin. Tu niyeta me tuneye em dev ji gundê xwe berdin. Li vir me bikujin û bişevitînin jî em ê axa xwe, gundê xwe bernedin. Mirov carekê dijî û carekê dimire, dema ku em mirin em ê dev ji gundê berdin heta ku em nemirin em ê dev ji axa xwe bernedin. Ji ber ku axa me namûsa me ye."

### 'ji ber qedexeya pisgirêkên aborî dijîn'

Şêniya bi navê Fatma Demîr ku 20 sal in li mezraya Mêrganê dijî jî got ku 20 sal in li gund bi zext û qedexeyan dijîn û ev tişt anî ziman: "Zozanên ku berê em bi serfirazî diçûnê niha ji ber qedexeyan em nikarin biçin wan. Êdî çi hizûra me nemaye. Ji ber astengiyên leşkeran em nikarin ji ber deriyê mala xwe zêdetir biçin cihekî din. Her wiha ji ber wan qedexeya em nikarin pezê xwe biçêrînin. Ji ber vê yêke jî em gelek zehmetî û pisgirêkên aborî dikişînin. Berê em bi serfirazî diçûn war û zozanên xwe me pancar kom dikir û difort."

### 'Armanca wan operasyanan birakujî ye'

Demîr, destnîşan kir ku şer û êrişa li dijî Herêma Kurdistanê bandor li wan jî dike û wiha pêde çû: "Ji ber êrişan li derdora gundê me gelek bargehên leşkerî hatine çêkirin. Bi fikara ku wê bên kuştin em nahêlin êdî zarokên me derkevin derve. Ev der axa me ye lê nahêlin em bi dilrehetî li axa xwe de bigerin. Li her derî şer û pevçûn heye; çar dorê gundê me girtine. Her wiha hemû gundên derdorên me qedexe kirine û weke 'herêmên ewlehiyê' îlan kirine. Dibejin, 'Li dora gundên we tiştên talûke hene'. Me heta niha tiştek wisa ne dîtiye. Kes nizane niyeta dilê wan çî ye. Sedem û armanca şerê ku li heremê dimeşînin ew e ku birakujiyê pêk bînin. Ji vê meqsed û mirazê zêdetir tiştek din naxwazin."

*MA/COLEMÊRG*



# Jinên ciwan yên Şingalê: Emê heta dawiyê Şingala xwe ji xayînan biparêzin

Jinên ciwan ên Êzidî yên beşdarî civîna ciwanan bûn destnîşan kirin ku ewê rê nedin ku destkeftiyên li Şengalê hatine bidestxistin werin tunekirin û ew ê ji bo xweseriya Şengalê têbikoşin.

Di konsepta pêymana 9'ê Cotmehê de ji bo pêkanîna hevpêymanê ji aliyê dewleta Tirk, hikûmeta Iraqê û PDK'ê ve êrişek bê navber li ser Şengalê tê meşandin. Li hemberî êrişên ku li hemberî îradeya azad û daxwaza xweseriyê ya civaka Şengalê tê pêkanîn, Şengalî xwedî li destkeftiyên xwe derdikevin û di nav têkoşîneke bê hempa de ne. Bi armanca nirxandina rewşa dawiyê ya Şengalê civîn tên lidarxistin. Duho jî bi pêşengtiya Yekîtiya Jinên Ciwan yên Êzidî û Yekîtiya Ciwanên Êzidî derbarê êrişên li ser Şengalê, li Geliyê Kersê civînek hat lidarxistin. Jinê ciwan ên beşdarî civînê bûn dan zanîn ku ewê li hemberî êrişan bi bilindkirina têkoşîn û berxwedanê bersiv bidin û destnîşankirin ku weke ciwan ewê rê nedin dagirkeran.

### 'Wê ciwan rê nedin dagirkeran'

Berdevka Yekîtiya Ciwanên Êzidî Sara Botan derbarê civînê de axivî û da diyarkirin ku ewê li hemberî êrişan li berxwe bidin. Sara Botan axaftina wiha berdewam kir: "Di komxebata xwe de me giranî da li ser



êrişên heyî. Weke ciwan di demek wiha de erka me ye ku em rola xwe bilîzin. Rûxmê di van demên dawiyê de artêşa hukumeta Kazimî bi taybet li ser me ciwan zextên mezin dikin jî, weke ciwan em guh nadin van êrişan. Ne tenê ji bo Şengalê weke ciwananên Êzidxanê em amade ne biçin çiyayên azad û tekoşîn bikin. Ji ber em dizanin ku ger gerîla nebe li ser van axan tu gel nikare bijî. Ji bo wê weke ciwan em rê nadin dagirkerî û êrişên qirêj. Em soz didin gelê xwe em ê heya dawiyê Şengala xwe ji xayînan biparêzin. PDK û Hukumeta Kazimî her roj ji bo Şengalê vala bikin her tiştî dikin, lê weke ciwan em ê bibin kelemên çavên wan, em rê nadin wan. Em ê li gel asayîş, YBŞ û YJŞ ya xwe bin."

### 'Emê Şengalê azad bikin xweseriya xwe saz bikin'



Sara Botan di dawiya axaftina xwe de qala kiryarên PDK'ê jî kir û wiha got: "Serê tevahî aloziyên li ser Şengalê PDK dikşîne. Ne tenê li Şengalê, li Kampên Başurê Kurdistanê gelê me bi her cure zehmetiyê re dihêle. Her roj malên wan dişewitin û ji bo gelê me venegere zextê li ser wan dikin. Weke ku ev têr nake li Şengalê jî bi sîxûrên xwe dixwazin tevlîheviyan çêbikin. Lê weke ciwan em rê nadin van lîstokan. Rûxmê hemû zextên wan jî, em ê wan her tim vala derxin, em ê Şengala xwe azad bikin û xweseriya xwe saz bikin."

### 'Em ê mil bidin milê gerîla'



Yek ji jinên ciwan a beşdarî civînê bû Înas Şengal destnîşan kir ku ew ê ji bo vala derxistina planên dagirkeran ên li ser Şengalê her tiştî bikin. Înas Şengal jî bi van gotinan nêrînên xwe anî ziman: "Îro di civînê de me êrişên li ser Şengalê nirxand, her wiha di pêşerojê de divê sekna me ya ciwanan çibe me bi hev re nirxand. Weke ciwanên Şengalê ji bo em planên li ser Şengalê vala derbixin em ê her tiştî bikin û em amade ne ku ji bo piştgiriya gerîla berê xwe bidin çiyayên azad. Ji ber gerîla me ji fermanê rizgar kirin û îro jî ji bo me hemuyan şer dikin. Em jî amade ne ku bi gerîla re li hemberî dagirkeran şer bikin û em ê mil bidin milê gerîla."

*JINHA*

# Gelo Tirkiye wê koçberên sûriyeyî di êrişan de bi kar bîne?

**Tirkiye di êrişên xwe de hêzên taybet yên PDK'ê û Tîma Xencerê bi kar tîne, lê dîsa encamê bi dest naxe. Hat zanîn ku niha jî koçberên ciwan yên sûriyeyî ku bi salan e "perwerde dike", ji bo ku di êrişan de bi kar bîne amade disekinîne.**

Desthilatdariya AKP-MHP'ê di 23'yê nîsana sala 2021'an de li dijî Herêma Federal a Kurdistanê êrişeke berfireh dabû destpêkirin lê bi tu awayî nekarî pêş bikeve. Îsal jî di 17'ê nîsanê de bi hevkariya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li dijî herêmên Zap, Metîna û Avaşînê dest bi êrişeke nû kir. Di êrişan de hêzên taybet ên Zêrewanî û Gulan ên girêdayî PDK'ê, çeteyên Roj, cerdevan û hêzên paramîlîter ên weke Tîma Xencerê bi kar tîne. Hat zanîn ku tifaqa AKP-MHP-PDK'ê ku nikarin windahiyên xwe veşêrin, niha jî xwe amade dike ku di çarçoveya bernameya "Perwerde-Biçekkirinê" de bermahiyên DAIŞ'ê yên tirkmenistanî û ozbek û ciwanên sûriyeyî yên penaber di êrişan de bi kar bîne.

Li ser xeta sînor a Çelê ya Colemêrgê û Qileban a Şirnexê gelemperî cerdevan û çeteyên Tîma Xencer ku bi salane li herêmê bi kiryarên xwe yên revandin, îşkence û komkujiyan tê naskirin hatine bicihkirin. Li herêmên başûrê Kurdistanê jî hêzên taybet ên Zêrewanî, Gulan û çeteyên Roj hatine bicihkirin. Derket holê ku bermahiyên DAIŞ'ê yên ozbek û tirkmenistanî ku bi salane li Tirkiyeyê tên veşartin jî di êrişan de tên bikaranîn. Ev komên navborî, di bin sîwana SADAT'ê de tên perwerde û biçekkirin, cil û bergên leşkerî yên li gorî herêmê li wan tên kirin û hewl didin li herêmên Zap, Metîna û Avaşînê bi cih bikin.

**PENABERAN DI BIN NAVÊ 'NATORVANIYÊ' DE QEYD DIKIN**

Ji îlona sala 2021'an heta niha ciwanên ji Sûriyeyê koçberî Tirkiyeyê bûyîn, di bin navê "notirvanî" û "peywirdarên ewlekariyê" de tên qeydkirin. Hat zanîn ku ev kes di çarçoveya bernameya "Perwerde-Biçekkirinê" de hatine wergirtin. Li gorî agahiyan, ev xebat bi pêşengiya efsarê TSK'ê yê bi navê Mesût û çeteyê bi navê Ebû Harîs Reqawî yê ji Sûriyeyê ve tê birêvebirin. Di vê çarçoveyê de bi taybet jî ciwanên Sûriyeyî yên bêkar di bin navê "notirvaniyê" de tên qeydkirin. Her wiha 300 TL mûçeyê didin wan. Ebû Harîs ku berpirsyarê ewlekariyê yê koma paramîlîter a Ehrar El Şamê bû, piştî ku DAIŞ'ê herêm dagir kirî nexwest bi wan re bixebite û reviya Tirkiyeyê. Harîs, piştî ku hatî Tirkiyeyê bi MÎT'ê re xebitî. Navê vî çeteyî di hemû karên tarî û qirêj ên MÎT û SADAT li ser penaberên Sûriyeyê dimeşîne de derbas dibe.

**PENABERAN BER BI HERÊMÊN ŞER VE DIŞÎNIN**

Hat zanîn ku efserê TSK'ê û endamê komên çete soz dane van ciwanên sûriyeyî ku dê tenê li "Saziyên Tirkiyeyê û li herêmên xwe bibin peywirdarên



ewlekariyê" lê belê di çarçoveya bernameya "Perwerde-Biçekkirinê" de ji perwerdeyeke giran re hatine derbaskirin. Li gorî agahiyan, komeke ku perwerdeya wan xelas bûyî ber bi herêmên Zap, Metîna û Avaşînê ve hatine şandin.

**CEBILXANEYA NEQEYDKIRÎ TÊXIN ZÎMETA XWE!**

Hat zanîn ku dewlet hewl dide çek, cebilxane û alavên leşkerî yên neqyedkirî ku di dema operasyonên taybet ên li dijî mafyayan de bi dest dixe, bi vê rê û rêbazê têxe zîmeta xwe.

**NAVÊ 180 KESAN HAT VEŞARTIN**

Li gorî Peymana Komîsertiya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (NY), qedexeye ku kesê di statûya penabertiyê de li dewleta ku lê dimîne di saziyên dewletê, leşkerî û hêzên ewlekariya sivîl de cih bigirin. Li gel vê yekê jî li Ofîsa Rihayê ya Komîsertiya Bilind a Penaberan a NY'yê 180 kes di bin navê "notirvaniyê" de hatine wergirtin û navên wan tên veşartin.

***MA / Erdogan Altan***

# Fermandarê HPG'ê Dr. Mazlûm: Kes nikare PKK'ê tune bike

**Ji fermandarên HPG'ê Dr. Mazlûm anî ziman ku dewleta Tirk ji tirsa pişta xwe spartiye teknîkê û got, "Dewleta Tirk timî îdîa dike ku wê PKK'ê tune bike. Bila zanibe; ji kesî nayê ku PKK'ê tune bike."**

Ji fermandarên HPG'ê Dr. Mazlûm bi wesîleya 46'emîn Meha Şehîdan a Gulanê ji ANF'ê re axivî.

Dr. Mazlûm destpêkê di şexsê şehîdên Meha Gulanê de şehîdên şoreşê hemû bi bîr anî û got, "Em şopdarên şehîdên şoreşê ne, em ê xwedî li keda wan derkevin. Bi taybetî Hakî Karer û Çaran (Ferhat Kûrtay, Mahmût Zengîn, Eşref Anyik û Necmî Oner) careke din bi rêzdarî bi bîr tînim. Em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe li ser şopa şehîdên xwe bin. Em îro bi saya wan hevalên xwe yên pêşeng gihîştin vê astê. Bi taybetî dîroka şoreşa me ji dîroka şoreşên cîhanê xwedî cihekî cuda ye. Di 28 raperînan de dagirkeran her tim polîtîkaya tunekirin, dagirkerî û qirkerî li ser Kurd û Kurdistanê meşandin.
Li hemberî vê yekê jî Rêber Apo li gel hevrêyên xwe dest bi têkoşîna



azadiyê kirin. Di encama ked û hewldana hevrê û Rêberê me de Kurd û Kurdistan ji aliyê tevahiya cîhanê ve têne naskirin. Meha Gulanê salvegera şehadeta Denîz Gezmîş û Îbrahîm Kaypakkaya ye. Wan jî bi rêzdarî bi bîr tînim. Divê em pêşengên hêja yên şoreşê neyên jibîrkirin, her tim li ser şopa wan bin. Sekn, jiyan û têkoşîna hevrêyên me yên şehîd bûne, îro jî ji bo me mînak e."

**HÛN KÊ TUNE DIKIN?**

Dr. Mazlûm bal kişand ser gefên dewleta Tirk û got, "Dewleta Tirk zane ku neheq e, lewma gelekî ditirse. Ji Asya Navîn hatin û Rojhilata Navîn û Kurdistan dagir kirin, piştre jî Kurd tune hesibandin. Lê belê cîhan tev zane ku eger ev şoreş bi ser bikeve wê çar parçeyên Kurdistanê ji dagirkeran rizgar bibe ûa zad bibe. Em ji vê yekê bawer dikin û îdeolojiya me jî xwe dispêre vê. Dewleta Tirk a dagirker ji ber tirsa ji vî şerî xwe spartiye hêza xwe ya teknîkê.

Timî îdîa dike ku wê PKK'ê tune bike. Hûn kê tune dikin? Bila her kes zanibe ku kes nikare PKK'ê tune bike. Li ser rûyê erdê Kurdekî bi tenê jî bimîne têkoşîna ji bo azadiya Kurdistanê wê dewam bike. Ev yek ji bo me zelal e. Faşîzma AKP-MHP'ê her Kurdek kiriye hedefa xwe û dijmin ragihandiye. Lewma divê her Kurdek bi vê têgihiştinê tevbigere."

***ANF***



# Ji girtiyê 30 salan pirsa 'tu poşman î?' kirin: Berdana wî 3 mehan hat paşxistin

**Lijneya Çavderî û Îdarî ya Girtîgehê ji Metîn Guven yê 30 sal in girtî, pirsa "tu poşman î?" kir. Ji ber bersiva waî ya "Min tiştekî ku jê poşman bibim nekiriye", berdana wî 3 mehan hat paşxistin."**

Girtiyên ku înfazên xwe temam kirine, bi hêceta ku "ne di rewşeke baş de ne" bi guhertina "Qanûna Înfaza Tedbîrên Ceza û Ewlekariyê û Qanûna Guhertina Di Hin Qanûnan de" ku di 1'ê Çileyê de li Meclisê hatibû qebûlkirin û di raya giştî de wekî "Qanûna Înfazê" tê zanîn, nayên berdan. Ji ber vê qanûnê berdana Metîn Guven ê 30 sal in girtî ye hate astengkirin. Guven ê hewce bibû di 30'ê Nîsanê de bê berdan, bi hêceta "ne di rewşeke baş de ye" berdana wî 3 mehan hate taloqkirin.

Lijneya Çavdêrî û Îdarî ya Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2'yan a Yozgatê, bi hêceta ku Guven "poşmantî" qebûl nekiriye, rapora ku Guven "ne di rewşeke baş de ye" amade kir. Guven ê di sala 1992'yan de hatibû binçavkirin û girtin rastî îşkenceyan hatibû bi dorê li Girtîgehên Amed, Amasya, Karabuk, Çankiri û Yozgatê hate ragirtin.

Bavê Guven ê cezayê lê hatibû birîn di 30'ê Nîsanê de temam kir, Abdûllah Guven bi lêv kir ku kurê wî di Girtîgeha Yozgatê de 2 meh in di hucreya yek kesî de tê ragirtin.

Guven, da zanîn ku beriya cezayê kurê wî xelas bibe hefteyekê, kurê wî li wan geriyaye û gotiye ku wê cezayê wî di 30'ê Nîsanê de xelas bibe û xwestiye biçin pêş girtîgehê wî pêşwazî bikin. Bav Guven, anî ziman ku bira û biraziyên wî çûne Yozgatê li pêş girtîgehê sekinîne lê tu bersiv ji wan re nehatiye dayîn. Guven, diyar kir ku piştî xizimên wî ji îdareya girtîgehê bersiv negirtin paş ve vegeriyane û wiha got: "Kurê min di axaftina telefonê ya di nava hefteyê de got ku 'bi awayekî keyfî ji min re 3 meh ceza dane.'"



**Înfaza girtî şewitandin**

Guven, diyar kir ku lijneyê ji kurê wî re pirsa "tu poşmanî" kiriye, kurê wî jî bersiva "min tiştekî ku ez jê poşman bibim nekiriye" daye û wiha berdewam kir: "Ji ber vê yekê înfaza kurê min şewitandin. Zilmeke mezin e ku mirovekî 30 sal in di girtîgehê de tê ragirtin neyê berdan. Nexweşiya kurê min a farenjit heye. Em mûameleya keyfî qebûl nakin."

Guven, da zanîn ku keça Sûda Guven jî 12 sal in di girtîgehê de ye û nihat li Girtîgeha Alanyayê tê ragirtin.

***MA/AMED***

# 'Erdogan hewl dide guhertina demografiyê mayînde bike'

**Evîn Cûma da xuyakirin ku Erdogan dixwaze beşek ji koçberan bişîne xaka Kurdan ya dagîr kirî û demografiyê bi rengekî mayînde biguherîne. Evîn Cûma got, "ev hem li dijî qanûnên navneteweyî ye hem wê şerê li herêmê girantir bike."**

Rêvebera Komeleya Mafên Mirovan a Cizîrê Evîn Cûma daxuyaniya Erdogan nirxand ku digot, "Em projeyekê amade dikin ku milyonek Sûriyeyiyan vegerînin."
Evîn Cûma diyar kir ku daxuyaniyên Erdogan li dijî qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî ye û got, "Li gorî qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî, eger hûn penaberan li welatê jê hatine vegerîne, divê hûn bişînin bajar û malên jê hatine. Ya duyemîn; li Sûriyeyê şer hînê neqediya ye. Mirovên ku ji ber şer reviyane û penaber bûne, vegerandina wan li herêma şer li dijî qanûnên navneteweyî ye. Erdogan jî dixwaze van mirovan bişîne herêmên Sûriyeyê yên ku bi xwe dagir kiriye. Ev xak û cihê ku ew mirov lê bêne bicihkirin ne yê wan mirovan e; yê gelê ku ji ber Erdogan bi zordarî koçber bûne. Hûn ê rabin hinekan bînin li şûna hinekî din bi cih bikin. Ev yek vegera xwezayî ya penaberan nîne. Sûc e."

**'Dixwaze di navbera gelan de şer derxe'**

Evîn Cûma ragihand ku desthilatdariya AKP-MHP'ê û muxalefeta dewletperest bi zexta li penaberan hewl dide penaberan bişîne herêmên Sûriyeyê yên dagirkirî û got, "Em li ser çapemeniyê dibînin bê zexteke çawa li Sûriyeyiyan tê kirin. Kesên ku dixwazin li Sûriyeyê vegerînin, bi zorê hewl didin vegerînin. Li dijî Sûriyeyiyan êrişên nijadperestî têne kirin, dewlet bi xwe hinek ji van êrişan teşwîq dike. Lewma ev projeya Erdogan li dijî qanûnan e, li dijî exlaqê ye. Dema ku hûn rabin civakekê li şûna hinekî din bi cih bike, hingî di navbera gelan de dibin sedema nakokiyan. Ji ber ku ev herêma hûn tînin ne ya wê civakê ye. Xwediyê herêmên dagirkirî heye, mirovên ji herêmên dagirkirî hatine koçberkirin hene, piraniya wan jî Kurd in. Bi vî rengî dixwazin di navbera Kurdan û Ereban de şer derxînin."

**'Demografî tê guhertin'**

Evîn Cûma ragihand ku yekane armanca bingehîn a bicihkirina penaberên Sûriyeyî yên li Tirkiyeyê li herêmên dagirkirî; Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî guhertina demografiyê ye.
Evîn Cûma got, "Di dema rejîmê de ji xwe bi vî mejî Kembera Ereb hate danîn. Gelek xakên Kurdan radestî Erebên ji Reqa, Dêrazorê û herêmên mîna wan hatin kirin. Bi vê kiryarê re demografî hatibû guhertin. Dewleta Tirk ji xwe di serî de li Efrînê li herêmên Sûriyeyê yên dagirkirî guhertineke demografîk kiriye. Niha jî qala anîna milyonek mirovî dike. Dixwaze van mirovan li Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê û Ezazê bi cih bikin û guhertina demografîk mayinde bikin."

**'Dixwaze herêmên dagîrkirî bi ser Tirkiyê ve bike'**



Evîn Cûma destnîşan kir ku Tirkiye dixwaze herêmên dagirkirî desteser bike û got, "Armanca Tirkiyeyê n e tenê guhertina demografiya herêmên dagirkirî ye. Dixwaze gelek herêman bi ser Tirkiyeyê ve bike. Çand, ziman, aborî û saziyên li van herêman hemû guhert. Mînak, tevî ku bajarên Sûriyeyê ne li van deveran bikaranîna pereyê Sûriyeyê qedexe ye. Pereyê Tirk tê bikaranîn. Înterneta Sûriyeyê hatiye birîn, înterneta Tirkiyeyê tê bikaranîn. Av, elektrîk hemû ji Tirkiyeyê tên dayin. Li Efrînê bi lêkirina dîwar re ji herêmên din ên Sûriyeyê qut dike. Her wiha li herêmên dagirkirî perwerde bi zimanê Tirkî û Erebî tê dayin, lê Erebî jî di asta duyemîn de tê dayin, bi giranî Tirkî derdixînin pêş. Ala Tirkan bi her derê ve kirine."

***ANF***

## Hewldana qirkirinê dewam dike

**Zekî Bedran**

Dewleta tirkî li seranserê Kurdistanê êrişên tinekirina destkeftiyan didomîne. Di bingehê tinekirina van destkeftiyan de temamkirina qirkirina Kurdan heye. Ji ber ku di stratejiya yek milet, yek dewletê de ti guhertin çênebûne, ka gelên din çawa tine kirine dixwaze Kurdan jî tine bike.
Erdoganê faşîst pêwîst nabîne ku vê stratejiya qirkirinê veşêre. Ji ber nebûna destek û itîfaqên Kurdan yên navneteweyî pir bêperwa ye. Dibêje, çawa be ez endamê NATO me, Amarîka û Ewropa pişta min digirin. Di pratîkê de jî wisa çêbû.
Sed sal in li ser Kurdan qirkirin dibe, bişaftineke hişk heye. Ji dinyaya Rojava deng dernakeve.
Piştgiriya tevayiya sûcên wê dike. Weke din PKK`ê û Kurdên berxwedêr terorîst nîşan dide.
Dewleta tirkî jî vê bi kar tîne. Rojava dagîr dike, dibêje ez korîdora terorê asteng dikim. Ciyên ji wan re dibêje korîdora terorê herêmên Kurdan yên di nava sînorên Sûriyê de ne. Kurdan ji ciyê wan derdixe li şûna wan Ereban û çeteyên xwe bi cî dike. Ewropa jî dike şirîkê vî sûcî. Dibêje yan hûnê çavê xwe ji min re bigirin piştgiriya min bikin, yan ezê van koçberan bi ser we de bişînim.
Ewropa jî bê pransîb e û li gorî berjewendiyên xwe tev digere. Dibêje koçberan bi ser min de neşîne tu çi dikî bike.
Erdogan dibêje em biryara Amerîka ya sivikkirina ambargoya li ser bakur-rojhilatê Sûriyê qebûl nakin û kî çi dibêje bila bêje tişta me li Iraqê kirî emê li Sûriyê jî bikin. Weke din dibêje, emê 500 hezar koçberan li herêmên di binê destê xwe de bi cî bikin. Dibêje ji bo piştgiriya pereyan em bi saziyên navneteweyî re gihatine pêvajoya dawî.
Ango wê herêmên dagîrkirî ji xwediyên wan paqij bike kesin din bi cî bike, li erdê Sûriyê hespê xwe bibezîne û pereyên wê jî ji hêzên derve bistîne. Tişta li Iraqê kirî çi ye? Bêguman êrişên bêsînor, dagîrkerî û avakirina baregehan e. Qadeke fireh bêmirov dihêle. Ji dinyayê bertekekê nabîne. Erêkirin û piştgiriya Amerîka û Ewropa distîne.
Erdogan dagîrkirina korîdora kurdî venaşêre.
Ev niyeta xwe li ser nexşeyê li NY anîbû ziman.
Vê planê gavbigav pêk tîne. Biryara Amerîka ya sivikkirina ambargoyê ji ber sedemên mirovî dike egera dagîrkeriyeke nû. Ku niyet dagîrkirin be peydakirina behaneyan hêsan e. Dibêje, ezê Kurdan tine bikim bila ti kes li pêşiya min nebe kelem.
Li bakur-rojhilatê Sûriyê bi milyonan mirov dijîn. Gel di nava xizaniyeke mezin de ye.
Çawa ku li van herêman mirov tinebin, dixwaze têgihiştina sirf `terorîst` hene biafirîne.
Di propaganda reş û derewan de faşîzma tirkî pir bitecrûbe û mahir e. Her roj nûçeyên 10-20 kesên dixwestin derbasî sînorê me bibin yan jî çalakiyan bikin hatin bêbandorkirin, diavêjin ajansan. Ma ev komên amadekariya çalakiyan dikin pez e ku her roj kom kom xwe bide kuştin? Van nûçeyên derew bi zanebûn bi navê wezaretê belav dikin. Niyeta wan xirab e. Dixwazin ji dinyayê re nîşan bidin ku sînorê wan di binê tehdîdê de ye. Ji ber wê ji bo rewakirina dagîrkirinê vê propagandayê dikin.
Ew kesê li serê MÎT`ê gotibû, afirandina egera şerê li heberî Sûriyê pir hêsan e, emê çend kesan bişînin wî milê sînor, çend fûzeyan bidin avêtin.
Tişta niha dibe ji wê ne cuda ye. Çawa me gotî niyeta wan paqijkirina Rojava ji Kurdan e û ji bo belavkirina dagîrkeriyê li Sûriyê amadekariyê dikin. Afirandina behaneyan jî ji bo wan pir hêsan e.
Niyeta Tirkên faşîst eşkere ye. Êdî planeke neyê fêmkirin nemaye. Heta li NY jî ev eşeke kirin.
Edogan jî tehdîdên xwe her tim dubare dike.
Ji bo wê bi taybetî gelê Kur û hêz û saziyên birêxistinkirî yên bi navê Kurdan hereket dikin, divê bi ruhê seferberiyeke rast bikevin tevgerê.
Divê rayagiştî ya dinyayê agahdar bikin û pêşiya van planên tarî bigirin.
Divê baweriya me hêza rastiyê hebe. Rejima zordarî û derewan ne mayînde ye. Yên xwedîheqerk û mafê wan yê berxwedanê heye.